

Xwizî

Xwizîkê wanê bi ruhê
dihejar, çunku paşatîa esmanî
bu wane.

Xwizîkê wanê xembar, çunku
dê êne dilşadkirin.

Xwizîkê kesê sernerim,
çunku ew dê erdê destve înin.

Xwizîkê bîrsî u têhnîê başîê,
çunku ew dê êne têrkirin.

Xwizîkê diluvana, çunku dê
diluvanî ête rêka wan.

Xwizîkê dilpaqija, çunku ew
dê Xwidê bînin.

Xwizîkê aştî çêkira, çunku dê
bêjine wan kurrê Xwidê.

Xwizîkê wanê ji ber dilpakê
tepeser dibin, çunku paşatîa
esmana bu wane.

Xwizîkê we dema ji ber min,
we kirê u tepeser diken u ji
drew ve hemî rengê xirab bi
we vedin. Dilşad u bextewer
bin, ji ber ku xelatê we li
esmana yê mezin e çunku wan
husa pêxemberê berî we jî
tepeser dikirin!

- Îsa (Mizgînîa Mettî 5:3-12)